Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1051 | 26-Adar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# 3.5 milyon li kolanan bûn

**Navenda nûçeyan**

**Li Fransayê di roja greva neteweyî ya nehemîn a li dijî reforma teqawîtbûnê, li gorî sendîkaya CGT'ê 3.5 milyon kes daketin kolanan.**

Koma radîkal Black Blok jî tevlî çalakiyê bû û demekê li hemberî polêsan şer kir. Li gelek deveran agir hate dadan. Li bajarên Rouen, Nantes, Lorient, Rennes, Bordeaux, Lyon û Toulouseyê şer qewimî.



Li tevahiya welêtê Franse, li zêdeyî 300 bajar û navçeyan de li dijî reforma teqawîtbûnê, çalakiyên şermezarkirinê hatin lidarxistin. Li gorî sendîkaya CGT 3.5 milyon kes tevlî çalakiyan bûn. Li gorî Wezareta Karên Hundir jî bêhtirî milyonekê kes tevlî çalakiyan bûn. Ji meha Çile û vir ve, ev cara 9'an e ku di asta neteweyî de li dijî reforma serokkomarê welêt Macron, grev tê kirin. Hikûmet dixwaze temenê teqawîtbûnê bike 64, Berê ev temen 62 bû. Ji bo li Meclîsê dengdan neyê kirin, xala 49.3 a Destûra Bingehîn, bi kar anînbûn.

Çalakiya herî mezin a şermezarkirinê li paytext Parîsê pêk hat. Li gorî CGT'ê 800 hezar kes tevlî meşa li Parîsê bûn.

### 457 kes hatin binçav kirin


Wezareta Karên Hundir diyar kir ku di dema xwepêşandanên 23'ê mehê de hêzên dewletê 457 kes binçav kir.

Li gel vê yekê grev û çalakiyên blokajê jî belav dibin. Ciwanan li zanîngehan tevlî tevgera li dijî reforma teqawîtbûnê bûn. Bi tevlîbûna ciwanan re tê gotin ku çalakî dibe radîkaltir bibin.

Di serî de ragihandina rêyên hesinî, metro, otobus, sektora gazê, bendergeh, stasyonên sotemeniyê, balafirgeh û sektora bermehiyan, li tevahiya welêt li gelek sektoran çalakiyên blokajê û grev hatin kirin. Di asta ji sedî 15 de li sotemeniyê kêmasî çêbûn.

# 'Kêmasiya avê ya heyî dibe ku veguhere krîzeke kûreyî'

**Neteweyên Yekbûyî, hişyar kir ku mirovahî mîna vampîran ava gerstêrkê dilop bi dilop diqedîne û dibe ku ev bibe krîzeke kûreyî ya avê.**



Sekreterê Giştî yê NY'yê Antonîo Gûterres, beriya Konferansa Avê ya NY'yê, di pêşgotineke rapora xwe de got: "Ji ber xerckirin û bipêşveçûyîna ya vampîrîk, bikaranîna avê bêyî hizir, qirêjî û germbûna kûreyê ya bêkontrol, dike ku vê çavkaniya jiyanê ya mirovahiyê dilop bi dilop biqede.. Mirovahi ketiye rêyeke bi xetere û em hemû rû bi rûyê encamên wê dibin."

Di raporê de hat diyarkirin ku li hin deran têr av nîn e, li hin deran jî ya lehî radibe ya jî av qirêj dibe û hat destnîşankirin ku dibe krîzeke avê ya kûreyî çêbibe.

Sernivîskarê raporê Rîchard Connor, di daxuyaniyê de ku da AFP'yê got: "Ne diyar e ku wê bandora krîza avê li çend kesan bibe. Heke tiştek neyê kirin wê xizmeta sanîtasyonê bi desten ji sedî 40-50'yê mirovan nekeve û ji sedî 20-25 jî nekare ava vexwarinê bi dest bixe."

Kongreya Avê ya NY'yê li New Yorkê dest pê kir û wê heta bi roja Înê dewam bike. Wê nêzîkê sed wezîr û 10 serokên dewlet û hikûmetan û şeş hezar beşdar tev lê bibin û ji bo her kes bikare xwe bigihîne ava paqij û tiwalet bi dest bikeve, wê li ser hedefên sala 2015'an bê sekinandin. Ji rêveberan daxwaz tê kirin ku tevdîrên şênber bigirin. Lê ji niha ve hin çavdêr ji çarçoveya van teahud û hebûna fînansmanê bi fikar in. ANF

40 salên dawîn bikaranîna ava vexwarinê ji sedî 1 zêde bû. Bi rapora Av'ê ya NY'yê îşaret bi kêmbûna avê bi germbûna kûreyî zêde dibe, tê kirin. Ango, nêzîkê ji sedî 10'ê nifûsa cîhanê li welatên ku kêmasiya avê gelek e dijî. Li gor rapora ku pisporên avhewayê yên NY'yê weşand, nêzîkê nîvê nifûsa cîhanê qet nebe demeke salê rû bi rûyê kêmbûneke cidî ya avê dibe.

Pêşbîniya bi raporê ew e ku ji bo heta bi sala 2030'î ava vexwarinê bi desten her kesî bikeve, divê asta razemeniyê herî kêm sê qatên din jî zêde bibe.

### Sudoku: Bersiv 60

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 8 | 1 | 9 | 2 | 6 | 5 | 7 | 3 |
| 2 | 7 | 6 | 5 | 3 | 4 | 8 | 9 | 1 |
| 5 | 9 | 3 | 1 | 7 | 8 | 6 | 4 | 2 |
| 8 | 2 | 7 | 3 | 6 | 1 | 9 | 5 | 4 |
| 1 | 4 | 5 | 2 | 8 | 9 | 7 | 3 | 6 |
| 6 | 3 | 9 | 4 | 5 | 7 | 1 | 2 | 8 |
| 7 | 5 | 4 | 6 | 1 | 2 | 3 | 8 | 9 |
| 9 | 6 | 8 | 7 | 4 | 3 | 2 | 1 | 5 |
| 3 | 1 | 2 | 8 | 9 | 5 | 4 | 6 | 7 |

### Sudoku:Pirs 61

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 8 | | | | | 1 | | 9 |
| 6 | | 7 | | | | | 2 | 5 |
| | | | 2 | 6 | 3 | | | |
| | | | 7 | | 9 | 4 | 1 | |
| 9 | | | | | | | | 8 |
| | 3 | 1 | 8 | | 6 | | | |
| | | | 4 | 5 | 8 | | | |
| 1 | 5 | | | | | 6 | | 4 |
| 4 | | 8 | | | | | 5 | |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Insiyatîf** (Fransî) | **1. Selahiyeta dayîna biryaran. 2. Teybetiya kesê dizane biryarên girîng bide: Filankes bi insiyatîf e. Di nava xwe de insiyatîfek ava kirin. Insiyatîf xist destê xwe.** |
| **Kanalîzasyon** (Fransî) | Di binê erdê de kanalên ku ava vexwarinê, yan jî ava pîs di wan de derbas dibe. Coya binerdî, Karêz. |
| **Kongre** (Fransî) | Civîna herî bilind ya partî, yan saziyekê ku biryar tê de tên dayîn, yan jî serok tên hilbijartin. |
| **Komplo** (Fransî) | Plan û projeyên bidizî. Bêbextî, mûamere: Serokên Kurdan tev bi komployan hatin girtin û kuştin. |
| **Konsept** (Fransî) | Konsept. Plan û projeyên ku gelek xalan di nava xwe de dihewînin: Êrişa ser Eyn Îsa parçeyek ji konsepta dagîrkeran e. |
| **Panel** (Fransî) | Rûniştin û civîna ji her kesî re vekirî. Yên tevlî dibin tev dikarin nêrîna xwe bêjin: Di tv. de li ser mijara jinan panelek hebû. |
| **Pêngav** | Destpêkirina karekî girîng, pêşdeçûyîn, çûna bi ser dijberê xwe de. Hemle: Pêngava 15ê Tebaxê ji bo Kurdan pir girîng bû. |
| **Semîner** (Fransî) | Civîna bi rêveberiya kesekî yan çend kesan, ji bo dayîna zanyariyan derbarê mijarekê de û gotûbêjkirina li serê: Mûhadere. Li ser mijara Neteweya Demokratîk semînerek hat dayîn. |
| **Slogan** (Fransî) | 1. Gotina kurt û balkêş ku nêrînekê diyar dike û bi hêsanî tê dubarekirin. Durişm: Çalakkeran bi "slogana" Bimire dagîrkerî" dewletên dagîrker şermezar kirin. 2. Gotina ku armanc û amûrên nasnema, civak û rêxistinekê bi awayekî cewher dide nasîn: Slogana filan partiyê ya vê serdemê wiha ye: |
| **Statû** (Fransî) | 1. Rewşa kesekî, di nava sazî yan civakê de: A. di şaredariyê de dixebite lê statûya wî (karker e, karmend de, berpirs e) ne diyar e. 2. Li welatekî rewşa civakekê di destûrnameyê de: Di destûra Tirkiyê de statûya Kurdan nehatiye diyarkirin. |

# ÛNÎCEF: Bi milyonan zarok di xetereyê de ne

**Navenda nûçeyan**

**Fona Alîkariya bi Zarokan re ya Neteweyên Yekbûyî (UNICEF), hişyarî kir ku fon ji bo alîkariya bi Yemenê re neyê veqetandin û got, dibe ku bi milyonan zarok rû bi rûyê xetera têrnexwarinê bibin.**




Di daxuyaniya nivîskî ya NÎCEF'ê ve hat ragihandin ku, ji 11 milyon zarokên mihtacên alîkariya mirovî yên li Yemenê, zêdeyê 540 hezar zarokên hêj pênc sal nekirine, rû bi rûyê pirsgirêka netêrxwarinê ya kujende ne.

Di daxuyaniyê hat diyarkirin ku her 10 deqeyan carekê zarokek jiyana xwe ji dest dide û da zanîn ku ew nikarin pêşiya vê mirinê bigrin.

ÛNÎCEF'ê, ragihand ku ji bo alîkariya bi Yemenê re dewam bike, pêdivî bi 484 milyon dolaran heye. Herwiha di daxuyaniyê de, hişyarî hat kirin ku eger bi lez û bez pêşî li vê pirsgirêkê neyê girtin, wê zarok rû bi rûyê rîska netêrxwarinê bibin.

Dîsa hat ragihandin ku eger alîkarî negihîje, dibe ku ÛNÎCEF ji neçarî alîkariya jiyanî ya zarokan bibire. Meha Sibatê welatên bexşker, soz da ku wê 1,2 milyar dolar bidin. Rêxistinên alîkariya mirov jî 4 milyar dolar fon dixwest.

Li gor Neteweyên Yekbûyî, sala 2023'yan pêdiviya ji siseyan duduyê Yemeniyan bi alîkariya lezgîn heye.



# 2 sal agahî ji Rêber Apo nayê girtin

Ji bo hevdîtina bi Rêber Apo re, di 2 salan de malbatê 131 carî û parêzeran jî 314 carî serlêdan kirin. Lê hemû selêdan bê bersiv man û tu agahî ji Rêber Apo nehatiye girtin. R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1051 | 26-Adar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# HEFTEYA QEHREMANTIYÊ SEMBOL Û LÛTKEYA BERXWEDANÊ YE

Pêşengên PKK'ê, ji 21 heta 28'ê Adarê navê xwe dane nivîsandin û dîrok dane guhertin. Ew zarokên gelê Arî bûn, Ji gelê xwe re xizmet kirin û heta roja me ya îro bi rihê wan têkoşîna azadiya Kurdistanê didome. R-5



## Serhildana Rojhilatê Kurdistan û Îranê dewam dike

Serhildana li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ya dijî rêjîma Îranê bê navber dewam dike, tevî kuştin , girtin û işkencekirinê jî, gel serhildana dewam dike.R-3

## Êrîşên dewleta Tirk a dagirker dewam dikin


Navenda Ragehandin û Çapemeniya HPG'ê diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker bi balafir, helikopter û çekên giran çeperên berxwedanê yên Gerîlayên Azadiyê bombebaran kirin.R-3

## 'Komkujiya Cindêrsê bi destê dewleta Tirk pêk hatiye'



Koçberên Efrînê yên li bajarê Qamişlo komkujiya Cindêrsê ya 20' Adarê Şermezar kirin û gotin, komkujiya Cidêrisê bi destê dewleta Tirk a dagirker pêk hatiye û divê cîhan bê deng nemîn e.R-5

## TJA: Em ê li dijî pergala êşkenceya Îmraliyê Têkoşînê mezin bikin




Tevgera Jina Azad ( TJA) bang li hemû jinan, di serî de jinên Kurd, hemû gel, sazî û rêxistinên navneteweyî yên ku aştî, azadî û demokrasiyê dixwazin kir û got, ji pergala êşkenceya Îmraliyê re bêjin 'raweste', li dijî tecrîdê têkoşînê bilind bikin.R-2

## Jinên ku guh nedan qedexeya Talîbanê Newroz pîroz kirin

Jinan li Efganistanê guh nedan qedexeya Talîbanê, li parkan û cihê qadên geştiyarî cejna Newrozê pîroz kirin.

CEJNA NEWROZÊ Û OLDARÊN SEXTEKAR
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

Ji Mezlûm heya Egîd dîroka lehengiyê
Farûk Sakik R-5

HEFTEYA LEHENGIYÊ
Ahmet Aktaş R-4

# TJA: Em ê li dijî pergala êşkenceya Îmraliyê Têkoşînê mezin bikin

Navenda Nûçeyan

**Tevgera Jina Azad ( TJA) bang li hemû jinan, di serî de jinên Kurd, hemû gel, sazî û rêxistinên navneteweyî yên ku aştî, azadî û demokrasiyê dixwazin kir û got, ji pergala êşkenceya Îmraliyê re bêjin 'raweste', li dijî tecrîdê têkoşînê bilind bikin.**

têkildarî negirtina agahiyan li Ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Tevgera Jinên Azad (TJA) daxuyaniyeke nivîskî da.

TJA'yê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku bi bi girankirina tecrîda li ser Rêber Apo tevahiya pirsgirêkan kûrtir dibib û wiha got: "Her ku ev polîtîkayên tecrîdê yên çaryek sedsalê dewam dikin, li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kûr dibin, bi taybetî jî komkujiya li ser jinan; Pirsgirêkên siyasî, civakî, aborî û ekolojîk jî bi heman rêjeyê kûr dibin û tevahî civak dikeve bin zextan."

TJA'yê da zanîn ku tecrîda giran ya ser Rêber Apo girêdayî êrşên ser têkoşîna azadiyê ye û wiha domand: "Bi Berxwedana fikrî, felsefî û siyasî ya ku Rêber Ocalan li Girava Îmraliyê pêş xist; Li Tirkiye û Rojhilata Navîn bi taybetî li Kurdistanê hêzek mezin daye têkoşîna azadî, demokrasî û azadiyê ya gelan, ciwan û jinan. Em dizanin û dibînin; polîtîkayên giran ên tecrîdê yên li ser rêzdar Ocalan, ji êrîşên li ser têkoşîna azadî û demokrasiyê ya gelan serbixwe nînin. Ji ber vê yekê em careke din diyar dikin; têkoşîna demokrasî û azadiyê tenê bi berxwedana li dijî tecrîda Îmraliyê dikare bê meşandin. Ji ber ya ku li Îmraliyê di bin tecrîdê de tê ragirtin; azadiya hemû jinan û gelan bi taybet jinên Kurd e."

**'Hûn nikarin heqîqeta me tarî bikin'**

TJA'yê da xuyakirin ku bi Paradîgmaya civaka 'Demokratîk, Ekolojîk, Azadîparêziya Jinê' ya ku Rêber Ocalan pêşxistiye, ancax bi azadiya xwe ya fizîkî wê bi jiyanî bibe. Ji ber ku em weke jinên Kurd azadiya xwe di vê paradîgmayê de dibînin. Ligel tecrîda 25 salan a li Îmraliyê, tecrîda mutleq û her cure bêhiqûqiyê; ti polîtîkaya mejiyê netewe-dewleta serdest nikare girêdana birêz Ocalan a bi jin, civak û gelê Kurd re ava kiriye, bişkîne. Ji ber ku heqîqet nayê veşartin. Hûn nikarin heqîqeta me tarî bikin!

Tevgera Jinên Azad (TJA) di dawiya daxuyaniya xwe de wiha got: "Em careke din destnîşan dikin ku muxatabê sereke yê hemû pirsgirêkên civakî, bi taybet jî pirsgirêka Kurd, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Em bang li hemû jinan, di serî de jinên Kurd, hemû gel, sazî û rêxistinên navneteweyî yên ku aştî, azadî û demokrasiyê dixwazin, ji pergala êşkenceya Îmraliyê re bêjin 'raweste', li dijî tecrîdê têkoşînê bilind bikin û azadiya civakî pêk bînin."

# Jinên ku guh nedan qedexeya Talîbanê Newroz pîroz kirin

**Jinan li Efganistanê guh nedan qedexeya Talîbanê, li parkan û cihê qadên geştiyarî cejna Newrozê pîroz kirin.**

Newroz, ji bo gelên Asya û Bakurê Afrîkayê cejneke kevnar e. Gelê Afganistanê jî her sal Newrozê ji bo xwe wekî serê salê dibîne, ji bo ku ew sal bi berhem, bereket û xweş derbas bibe, bi coşeke mezin pîroz dike.

Gelê Afganistanê bawer dike ku roja Newrozê çûyîna cihên şînahî, tevahiya salê, mirov wekî wê xweşikbûna biharê û şînahiyê zindî dihêle û roja Newrozê berê xwe dide cihên şîn û geştiyariyê. Ji bo Newrozê cilên nû li xwe dikin, ji çend roj berê ve xwarin tên amadekirin. Şêrînahiya bi navê samnak ku di çanda gelê Afgan de heye li her malê tê çêkirin.

**Gotibûn Newroz 'guneh e' û qedexe kiribûn**

Talîbana ku Newrozê û cejnên wekî wê wekî "guneh" didît û qedexe dikir, piştî ku di sala 2021'ê de bû desthilatdarî nehişt Newroz were pîrozkirin. Sedema bingehîn a vê



qedexeyê jî ew bû ku gel ji cewher û çanda xwe dûr bikeve, bê bîr bimîne. Her ku Talîban hewl dide xwe wekî destpêka dîrokê bide nîşandan, rastî girêdana gel a bi

nirxên civakî tê.

**Jin û ciwanan peyama 'berxwedan didome' dan**

Komek jinên Afgan û ciwan, pîrozbahiyan li dar xistin û di medyaya dîjîtal de parve kirin. Bi vê yekê peyam dan ku ew teslîmê Talîbanê nebûne û berxwedana

wan didome. Tevgera Jixweber a Jinên Afganî (Spontaneous Movement of Women Activists in Afghanistan) Newrozê bi coşeke pir mezin Newrozê pîroz kir, bir-

yardariya ji bo têkoşînê anî ziman.


**Jinan guh neda qedexeyan berê xwe dan parkan**

Yek ji bajarê Efganistanê yê Newroz bi coş lê hat pîrozkirin Bamyan bû. Her çendî wekî demên berê bi coş nebe jî, şêniyên bajarê berê xwe dan park û qadên geştiyariyê geşt kirin û kêfxweş derbas kirin. Li bajarê ku gelek kesên wê di warê aborî de bi zorê debara xwe dikin, zêdetir kes çûn parkên lîstikên zarokan. Parkên ji bo zarokan (luna park) beriya demek ji bo jinan hatibû qedexekirin lê jinan tevî vê qedexeyê jî berê xwe dan wan parkan.

Yek ji jinên ku Newrozê li parkê pîroz kir Noorjan Brat bû. Wê got ku ew bi xwe ji bajare Ghorê ye û ji ber sedemên aborî koçî Bamyanê kiriye. Noorjan Brat, diyar kir ku 3 zarokên wê hene, ji bo wan hatiye parkê û Newroz pîroz kiriye, hevala xwe Fazileh Gol-Ahmad nîşan da û got ku ew dixwazin li ser şînahiyê rûnin derdên xwe ji bîr bikin. Noorjan Brat herî dawî xwest îsal ji bo gelê Efganistan bi xwe re aştî û bereketê bîne. **JÎNHA**

# Girtiyên jin ên Îranê daxuyaniyeke hevpar dan

**6 girtiyên jin ên ji girtîgehên Îranê hatin berdan, daxwaza serbest berdana hemû girtiyên siyasî, bi taybetî yên jin kirin.**



6 girtiyên jin ên ji girtîgehên Îranê hatin berdan, daxuyaniyeke hevpar a nivîskî weşandin. Li gorî nûçeya NÛJINHA'yê, jinan diyar kirin ku tenê azadî têrê nake û diyar kirin ku heta hemû girtî azad bibin ew ê têbikoşin.
Daxuyaniya girtiyên ku serbest hatin berdan Nada Nacî, Amîna Zamanî, Sibîde Salarond, Leyla Mensûr, Nazîla Merûbîan û Saba Çardost wiha ye: "Cezayê demdirêj ê girtîgehê gefê li jiyana girtiyên nexweş ên weke Samana Asgarî, Elaha Mohammadî û Nîlufer Hamîdî dixwe. Dîsa Sarûnaz Ehmedî 6 sal piştî serbestberdana wê hate cezakirin. Me lêborîn nexwest. Em ji destpêkê ve bêsûc bûn. Ji ber vê yekê piştî ku biryar hat dayîn em hatin berdan, lê belê weke ku dihate xwestin me nekarî azadiya xwe bi dest bixin. Azadiya rastîn tenê dema ku hemû girtî serbest werin berdan dikare pêk were. Hemû girtiyan serbest berdin."



# Mêhtinger porên wan jî kurr dikin!

**Ji bo xelkên xwecihî yên Emerîkî porê dirêj ji nîşaneyên çanda wan a qedîm bû û jin û mêran porê xwe dirêj dikir. Lê mêhtingerên parzemînê ji porê wan ê dirêj pirr aciz bûn. Wan baş dizanîbû ew nasnameya wan e. Ji ber wê jî wan porê wan kurr dikir.**

Dema mêhtinger xwe li herêm yan jî welatekî bi cih dikin ji bo xelkên li wê herêmê bi bişaftinê ji holê rakin, rêbazên cûr bi cûr bi kar tînin. Tişta ku wan mijûl dike, ew pê aciz dibin. Guhartina tenê çand û zimanêkî walatekî têrê wan nake, ew dixwazin xelkên li wir bi awayekî fizîkî jî biguherînin. Yanî bi xezebeke har tevdigerin û hin nîşaneyên ku îşaret bi rêûresmên wan xelbi navê "My Powerful Hair" (Porê min ê bi hêz) ya nivîskar Carole Lindstrom hewl dide vê rastiyê bi îllûstrasyonan nîşan bide. Ew her wiha bi van xêzan çanda nişştecih a xelkên xwecih ên bakurê Emerîkayê jî tîne bîra xelkê û behsa zilma li ser wan dike.
Carole Lindstrom jî ji van xelkên xwecih e. Li eyaleta Nebreska ya ser bi Emerîka hatiye dinyayê. dihise? Li mala wan, li ser dîwarê ku televizyon lê ye, fotografek heye. Di fotograf de dapîr û du xaltîkên wê hene.
Lindstrom wiha behsa fotograf dike; "Li ser wan formayên spî hebûn û porê wan hatibû kurr kirin. Di fotograf de xerîbiyek hebû lê ez tênedigihîştim. Min hîs dikir ku tiştek kêm e." Ji ber vê meraqa xwe jî derbarê fotograf de ji diya e. Li vê herêmê xelkên xwecihî dikarin xwe biparêzin û perwerde bibin. Gelek zarokên xwecihan li vir bi zimanê xwe perwerde dibin û çanda xwecihên Emerîkî bi vî awayî nayê jibîrkirin. Cherona Jerome û kurê xwe jî li vê herêmê dijîn. Cherona Jerome di heman demê de mamoste ye û pirtûka Lindstrom bi wan dide xwendin. Kurê wê Talon Jerome pirtûka Min porê xwe kurr kir…porê min li gel wê kete gorê. Ev tişt di çanda me de heye û îşaret bi şînê dike."

**Ji bo ji çanda xwe şerm nekin**

Lindstrom weke nivîskareke ji xelkên xwecihî yên bakurê Emerîkayê, hewl dide bi pirtûkan behsa çanda xelkên xwecihî ya êdî jibîrkirî bike. Ew dide zanîn ku dapîr




kan dikin jî ji holê radikin. Mirov nimûneya vê yekê li Emerîkayê, di helwêsta li hemberî xelkên xwecihî de baştir dibîne. Ewrûpiyên ku Emerîka kirin mîhtingeh, dema xwestin xwecihên rêbazên pirr hişk bi kar anîn û bi çavsorî êrişî wan kirin. Gelek ji wan kuştin û yên nikaribûn bikujin jî, xwestin bi riya bişaftinê biguherînin da ku rabihuriya xwe ji bîr bikin.
Ji bo xelkên xwecihî nexasim jî "porê dirêj" gelek girîng bû. Porê dirêj yek ji nîşaneyên çanda wan ya qedîm bû û jin û mêran gişan, porên xwe dirêj dikirin. Lê nijadperestên li Emerîkayê ji porê dirêj ê xelkên xwecihî pirr aciz bûn. Wan baş dizanîbû ku ew porê dirêj nasnameya çermsoran e. Ji ber vê yekê jî nedixwestin çermsoran bi porê dirêj bibînin. Ji lewma jî demeke dirêj nehiştin ku çermsor porên xwe dirêj bikin. Wexta ku zarok hinekî mezin dibûn, porê wan dihat kurr kirin. A rast wan kurr nedikir, wisa kiribûn ku malbat bi xwe bitirsin û nedihiştin porê zarokên wan dirêj bibe. Pirtûka Dema ew keçikeke piçûk bûye, xwestiye porê xwe dirêj bike. Lê dema vê yekê dixwaze dêya wê tim li hemberî wê derdikeve û beriya ku porê wê dirêj bibe, kurr dike. Ew jî mecbûr maye potikan bi porê xwe ve girê bide û bi vî awayî xwe xapandiye! Li gorî Carole Lindstrom tîne ziman, ti carî wê fêhm nekiriye bê ka çima diya wê destûr nedaye ew porê xwe dirêj bike. Wexta ku porê wê hinekî dirêj bibûya diya wê jê re digot; "Divê em porê te kurr bikin, tu dişibî hovan!" Ew gotina diya xwe ya di zarokatiyê de bi vî awayî bi bîr tîne û dide zanîn ku ev gotin qet ji bîra wê neçûye. Jixwe, ev gotin meraqa wê zêdetir dike û hîna di zarokatiyê de dike ew pirsan di serê xwe de bibe û bîne.

**Birînên li dibistanên bişaftinê**

Carole Lindstrom, her çiqas xwestibe ji diya xwe bipirse jî, diya wê ti carî bersivek nedaye wê û ev pirsên wê bê bersiv hiştine. Lê Carole Lindstrom çawa bi vê yekê xwe pirsan dike. Diya wê wiha lê vedigerîne; "Ha…xaltîkên te wê demê diçûn dibistana leylî, ya ji bo xwecihên bakurê Emerîkî hatibûn qeydikirin û li wir dixwendin." Ji xeynî vab gotinan, diya wê tiştekî din nabêje jê re.
Di salên 1945'an de li Dibistanên Leylî yên ji bo Xwecihên Emerîkî de li zarokên xelkên xwecihî gelek zorî dihat kirin û dewletê dixwest wan li wir asîmîle bike. Zimanê wan qedexe bû û bi ser de jî porê wan dihat kurr kirin! Jineke ku wan salan li van dibistanan xwendiye dibêje, "Ji bo ez karibim li wir bijîm, min her roj li ber xwe da. Di dilê min û serê min de birînên ku hîna jî derman nebûne, nekewiyane, çêbûn."

**Porê me çavkaniya bîranînên me ye**

Nivîskar Lindstrom ku ji xelkê eşîra Anishinaabe/Métis e, li herêma "Turtle Mountain Reservation" dijî. Ev herêmeke taybet a xwecihên Emerîkî ye û li Dakotaya Bakur "My Powerful Hair" wiha pênase dike, "Porê me hêza me xelkên xwecihî nîşan dide, her wiha ew çavkaniya bibîranînên me ye jî."

**Porkurrkirin îşaret bi şînê dike**

Cherona Jerome jî ji bo pirtûkê got; "Serpêhatiyeke pirr balkêş e, ev serpêhatiyên di pirtûkê de elaqedarî serpêhatiyên me yên rastî ne. Di salên 1945'an de diya min û xaltîkên min jî weke yên Lindstrom çûbûn dibistanên leylî. Wan li wir pirr zehmetî dît, diya min bi zorê ji wir filitî. Tê bîra min li mala me fotografên wan hebûn. Di wan fotografan de porê wan hatibû kurrkirin." Di pirtûkê de keçikeke ciwan heye, dema bapîrê wê Nimishoomis dimire, porê xwe kurr dike û dibêje, "Ji bo hêz û enerjiya min li gel wî bimîne min bi vî awayî xatir ji kalikê xwe xwest." Jerome dide zanîn ku serpêhatiya keçikê, serpêhatiyên wê jî anîne bîra wê û got; "Dema dapîra min wefat kir min jî heman tişt kiribû. û bapîrên wan ji tirsa mêhtinger û nijadperestan newêrîbûne bi rehetî behsa çanda xwecihan bikin û ji ber tirsê jî tim ji çanda xwe şerm kirine! Lê Lindstrom nivîskareke nifşê nû ye. Ji bo ku xelkên xwecihî fêrî çanda xwe bibin û jê şerm nekin, pirtûkan dinivisîne. Her çiqas destpêkê weşanxaneyan xwe nêzî pirtûkên wê nekiribin û ew çap nekiribin jî, wê dev ji hewldana xwe bernedaye û di dawiyê de bi awayekî pirtûkên xwe dane çapkirin. Heta, wê bi van pirtûkên xwe gelek xelat jî wergirtine.
Lindstrom herî dawî dibêje; "Ez dixwazim, dema kesekî ji xelkên xwecihî rahişt vê pirtûkê xwe baş hîs bike û têbigihîje ku çandeke wan a qedîm heye. Di wexta min de kesî tiştekî wiha nekir ji bo min. Porê min jî hatibû kurrkirin, heta hin caran boyaxa zer jî li porê min didan. Yanî dema ez ciwan bûm ez ne ez bûm! Min nizanîbû serpêhatiya xelkê min çi ye û ew niha di çi halî de ne."

**Yenî Ozgur Polîtîka**

# Li Rojava atolyeya sînemayê dest pê dike

TEV-ÇAND li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, atolyeya sînemayê organîze dike. Perwerdehî, wê 45 rojan bidome. Serlêdanên ji bo atolyeyê, heta 5'ê Nîsanê berdewam in û wê atolye 8'ê Nîsanê dest pê bike.

**Nûjiyan Adar/ANF**



Tevgera Çand û Hunerê ya Demokratîk (TEV-ÇAND), di projeya Atolyeya Sînemayê de ku pêşengiya wê dike, Komuna Fîlm a Rojava, Şanoya Çiya û Sîne Şano bi awayekê çalak bi rolê xwe radibin. Komên sînema û şanoyê yên girêdayê TEV-ÇAND'ê, wek her car ked ji bo vê projeyê jî da. Dersên Atolyeya Sînemayê ev in; Dîroka Sînemayê, Senaryo, Xwendina Fîlman, Deng, Kurdî û Sînemaya Şoreşger, Kostum-Dekor, Kamera, Rejî, Ronî, Montaj û Produksiyon. Kedkarên Çandê û hunerê Şêro Hindê, Haşim Aydemîr, Nûman Yîgît, Dîrok Artos û Ekîn Ronî jî perwerdekarên atolyeyê ne.

Serlêdanên ji bo atolyeyê, 23'yê Adarê dest pê bûn. Temenê serlêdanê 16-25 e. Kesên ku ser lê bidin, wê hevdîtin bi wan re bê kirin. Kesên serlêder, ne şert e ku berê cih di nav xebatên çandî û hunerî de cih girtibin. Di perwerdehiyê de ya esas dilxwazî ye. Wê 8'ê Nîsanê dest pê bibe û 45 rojan bidome.

Piştî perwerdehiyê wê sertîfîkayê bidin şagirtan. Şagirtên baş û dilxwaz, wê bikarin tev li Komuna Fîlman a Rojava bibin. Navenda Atolyeyê, Qamişlo ye, lê ji bajarên din jî ser lê tê dayîn.

Şagirt, piştî bidawîbûna perwerdehiyê wê tev li projeyên fîlmên kin bên kirin û wê ev fîlmên kin, havînê bên kişandin.

Salên dawîn, gelek fîlm hatin çêkirin. Komuna Fîlman a Rojava, 14'ê Tîrmeha sala 2015'an ava bû û pêşengî ji gelek xebatên hunerî re kir. Fîlmê Ji bo Azadiyê û Kobanê, rêzefîlmên Evîna Kurd û Tava Sor jî kişandin. Ji bo bipêşvebirina hunerê gelek hewil da. Komuna Fîlman a Rojava, ji sala 2015'an ta bi niha gelek caran perwerdehî daye.

Atolyeya Sînemayê ku pêşamadehiya Akademiya Çand û Hunerê ye, sînemakaran wê ji bo pêşerojê û akademiya ku wê bê vekirin digihîne. Li Akademiya Şehîd Yekta ku ji aliyê TEV-ÇAND'ê ve hat vekirin jî du salan perwerdehiya çandî da. Piraniya ciwanên li vê akademiyê perwerde bûn, hêj jî di xebatên TEV-ÇAND'ê yên li Rojava de, di xebatên çandî û hunerî de bi rolên giring radibin. Bi taybetî di fîlmê Ji bo Azadiyê, Kobanê û rêzefîlmên Tava Sor û Evîna Kurd de lîst.

## CEJNA NEWROZÊ Û OLDARÊN SEXTEKAR



Hafiz Ahmet Turhalli

Cejna NEWROZê bi hezarî salane tê pîroz kirin. Ev Cejn ji Rojhelata navîn heta Qafqasan tê pîrozkirin. Bi taybet ji ber ku ev cejn bingeha xwe ji azadî û serkftina gelê Kurd digre, gelê Kurd vê cejnê bi coş pîroz dike. Lewra gelê Kurd wateya Newrozê ya rasteqîne dizane û liv û tevgera wê jî, li gor wê rastiyê pêk tîne. Ev çend salên dawî bi taybet dewleta Tirk û hevkarên wê; Dixwazin bi navê Ola Îslamê cejna Newrozê, wek cejnekî dijî Ola Îslamê bidin nasandin.

Ev rewşa û nîqaşên hanê, ne ji bo rastiya Îslamê ne, berovajî wê, bi rengekî gemar û sosret bikar anîna Îslamê ye. Lewra xwedî derketina nirxan ji bo milletan, millet bûyinê bi xwer peyda dike. Ev rewş bi taybet ji bo dewleta Tirk metirsîdar e. Sedsale Qanun û yasa derxistin, jin û zarokên kurd kuştin, rexmî wê jî, nikaribûn pêşî li milletbûn ê xwebuna Kurdan bigrin. Bi van nîqaş û fetwayên derewîn, dixwazin, serê gelê me di Cejnên wê yên netewîde şîlo bikin. Tevlihevîyên bîrdozî, çandî, zimanî û dîrokî pêş bixin. Gelê Kurd zêdetirê xwe ji Ola îslamê bawer dike û wek bawermendên saf û paqij tev digere. Îslam ji bo desthelata xwe bikar neaniye û nizane bikar jî bîne. Ew kesên NEWROZA me heram dikin, li ser sofra dewleta Kemalîst nan dixwin, bi mûçeyê wan jiyana xwe didomînin. Cejnên van dewletan yên derewîn wek putperestan pêk tînin, ew jî tevlî van cejnên derewîn dibin, ku di rastiya xwede ev cejnên van desthelatan, cejnên zilm, talan û dagirkeriya millet û welatên dîtirin. Qur'an ji serî heta dawî dij derketina zilmê wek erka sereke ya bawermendên ola Îslamê pênase dike. Newroz dij derketian zaliman û azadiya bindestan e. Gelo kîjan Pêxemberî ji bo gelan bike bindest kar kiriye? Kijan pêxember welatê gelên dîtir dagir kiriye? Gellekî mûfessîrên Qur'ana pîroz dibêjin Behsa NEWROZê di Qur'anê de hene.

Bi sond be, me Mûsa ji bo gelê xwe ji taritiyan ber bi ronahiyê derxîne û rojên Xwedê bi bîra wan bîne, me ew bi mucîzeyan şand. Di vênade ji bo kesên bi dijwarî berxwe didin û gellekî sipasiya Xwedê dikin îbret hene. (Îbrahîm 5(

Mûsa: Got bira dema hevdîtina me û civandina mirovan, roja cejnê serê şefeqê be. (Taha 59)

Despêkê de Îbnî Kesîr û gellkeî şîrovekarên Qur'an a pîroz, dibêjin ev roj rojên NEWROZê ne.

Numanê kurê Sabît ku bi navê xwe yê nasraw Ebu Henîfe û şagirdên wî dibêjin: Rojiya ferz ne têde, kê Roja NEWROZ ê rojiya Sunnet bigre Mekruhe.

Bapîrê Ebu Henîfe li derdora Besrayê parêzvanê sînore û Hz Elî buye mêvanê wî. Wê sibhê Millet çilên xweyê nuh li xwe kirine û hêkên neqiş kiri lihev belav dikin. Hz Elî dipirse ev çi roje? Ew jî behsa NEWROZÊ dike. Hz Elî dibêje ‚xwezî her roj NEWROZ biya'.

Belê Olfroşên Tirkan û Nijadperestên Ereban dibêjin NEWROZ herame. Ev Îftîraye li Xwedê û Pêxemberê me ye.

Jivanan zalimtir kes nîne. Ev kesayetan bê tirs îftîra li Ola Îslamê dikin. Tirsa wana sereke, ewekû Kurd bigîhîjin mafên xwe. Tirs têrê nake winê têk biçin. Newroz Pîrozbe.

# Koçberên ji ber erdhejê bi hevgirtinê li ber xwe didin

**Hevberdevka GOÇÎZDER'ê Pinar Kamîle Kandal diyar kir ku li Stenbolê wan xwe gihandine hezar kesên ji herêma erdhejê koç kirine û got "Koçberên ji ber erdhejê bi hevgirtinê li ber xwe didin."**

Hevberdevka Komeleya Şopandina Koçê (GOÇÎZDER) Pinar Kamîle Kandal xebatên xwe yên li ser kesên ji herêmên erdhejê koç kirine nirxand.

Kandal diyar kir Komeleya Şopandina Koçê, HDP, HDK, DBP û Partiya Kesk a Çep bi hev re ji bo malbatên ji herêmên erdhejê hatine Stenbolê xebat dane destpêkirin û got "Me serdana malbat û kesên mexdûrên erdhejê yên ku hatin navçeyên Stenbolê kir. Me xwe gihand nêzî hezar malbatê. Me alîkariya xwarin û cilan da van malbatan. Di serdanên xwe de me li wan guhdarî kir, me têkilî danî û me bi wan re hîs kir ku em bi hev re ne. Piraniya malbatên ku tên malbat û kesên ku xizmekî wan ê nêzîk an jî xizmekî wan heye. Mînak, yên ku xwedî zarok, xwişk û bira, xizmên wan in. Me bi rêya kesên ku bi dilxwazî malên xwe vekirine, ji bo kesên ku cihê wan tune ye mal saz kir. Hin malbatên xwebexş gotin ku ew dikarin 3 mehan, hin 6 mehan û hin jî 1 salekê li cem me bimînin an jî li mala me ya vala bimînin. Bi qasî ku ji destê me hat me li nexweşxaneyê serdana birîndaran kir. Em çûn serdana malbatên qelebalix ên li otêlan dimînin. Hin malbat piştî ku hatin Stenbolê piştî demeke kurt çûn bajarekî din."

Kandal derbarê hejmara kesên ji herêmên erdhejê koç kirine got "Ji Meletî, Semsûr, Hatay û Mereşê koça ber bi Stenbolê zêdetir e. Raporên me yên li ser vê xebatê berdewam dikin. Di rojên pêş de em ê rapora erdhej û koçberiya Stenbolê pêşkêşî raya giştî û çapemeniyê bikin. Her wiha malbatên ku me xwe gihandibûn û gihîştin me hîn jî berdewam dikin. Em hewl didin ku bi qasî ku ji destê me tê bibin piştgirî. Em hewl didin di van rojên dijwar de bibin yek.

Ji herêma erdhejê herî zêde koçî Mêrsîn, Antalya, Enqere, Mêrdîn û Wanê bûn. Ji bilî van bajaran koçberiya Amed, Îzmîr û Stenbolê jî heye. Mînak em dizanin ku 200-300 hezar koçber li Mêrsînê hene. Li gorî daneyên ne fermî li Stenbolê derdora 40 hezar koçber hene. Ji bilî kesên ku li cem xizm û nasên xwe bi cih bûne, gelek kes jî hene ku ji aliyê dewletê ve li malên xwendekaran, li otêl û li hin tesîsên şaredariyê tên bicihkirin. Lê li vir bi tenê dikarin mehekê bimînin. Piştî mehekê derketinê li ser mirovan ferz dikin. Ev jî heye kesên ku li gundan malên wan hene, çûne gundan. Bi rastî me dît ku koça ji herêma erdhejê bi piranî ber bi derûdora herêma erdhejê ve, yanî ber bi bajarên nêzîk ve ye. Mînak Stenbol cihek e ku bi gelemperî gelek koçberî lê tê kirin, lê ji bajarên ku me behs kirin koçberî kêm e."

Kandal diyar kir ku gelek xwebexş, çi li bajarên xwe yan jî li Stenbolê, hewl didin ku alîkariya van kesan bikin ku bandorên wêranker ên erdhejê derbas bikin û got "Her wiha em dizanin ku li bajarên ku mirov koç kirine, kirê gelek zêde bûne. Em dibin şahid ku kirê du kat zêde bûye. Bi taybetî li Mêrsîn, Entalya û Enqereyê û li Stenbolê ji ber ku ev demeke dirêj e ku kirêya xaniyan ewqas zêde bûye, ev rewş ne nû ye."

Hevberdevka Komeleya Şopandina Koçê Pinar Kamîle Kandal bal kişand ser alîkariya psîkolojîk û got "Pêdiviya her kesî bi piştgiriya psîkolojîk heye. Ji ber ku ew her tim dixwazin qala kêliyên ku dijîn bikin. Ew dixwazin ku hûn guh bidin zor û zehmetiyên ku ew tê re derbas dibin. Bi taybetî yên ku ji bin kavilan derdikevin travmayên wan ên derûnî yên girantir hene. Aliyê civakî, psîkolojîk, koç û aboriyê yê erdhejê didome û wê demeke dirêj bidome jî. Komeleya me jî xebatên xwe didomîne. Salên giran li pêşiya me ye lê em ê bi hevgirtinê xwe ji vê rewşa zehmet rizgar bikin." **ANF**



# Serhildana Rojhilatê Kurdistan û Îranê dewam dike

Serhildana li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ya dijî rêjîma Îranê bê navber dewam dike, tevî kuştin , girtin û işkencekirinê jî, gel serhildanê dewam dike.

**Navenda Nûçeyan**

Serhildana gel ku bi dirûşmeya 'Jin, Jiyan, Azadî' li Rojhilatê Kurdistan û Îranê destpêkiribû, bênavber dewam dike.

Di 24'ê Adarê de weke her Îniyên din, bi hezaran kes li bajarê Zahîdan ya Beluçistanê daketin qadan û dijî desthilatê nerazîbûna xwe anîn ziman. Xwepêşandanderan xwestin desthilatdarî were rûxandin. Xwepêşanderên Beluçistanê diyarkirin ku ew dixwazin sîstemek wisan were avakirin ku li Îranê hemû pêkhate bigihin mafên xwe û herêmên xwe birêve bibin. Bi taybet hejmarek zêde ya jinan di xwepêşandanê de amade bûn û bê navber dirûşmeya 'Jin, Jiyan, Azadî' qêriyan.

Di heman demê de li bajarê Galîkş ya ser bi parêzgeha Gulistan ku zêdetirî xwe Tirkmen lê jiyan dikin, çalakiyên nerazîbûnê hatin lidarxistin. Di çalakiyan de xwepêşanderan piştgirî dan çalakiyên li Beluçistan û herêmên din yên Îranê.



Hêjayî gotinê ye di 30'ê Îlona 2022'yan de bi destpêkirina serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' re li bajarê Zahîdanê jî xwepêşandanek mezin hatibû lidarxistin. Hêzên Îranê êrişî xwepêşanderan kiribûn û herî kêm 100 kes kuştibûn. Ji wê rojê ve her roja Înî xelkê Zahîdan dadikevin qadan.

**Cezayê darvekirinê**

Li aliyekî din li gorî Malpera Tora Mafê Mirov a Kurdistanê ragihand, di rojên borî de, Dadgeha Şoreş a bajarê Urmiye cezayê 10 sal girtîgehê li 5 kesan û cezayê bidarvekirinê jî 5 welatiyên xelkê parêzgeha Urmiye birî. Tora Mafê Mirov a Kurdistanê diyarkir ku ew 10 kesên hatine cezakirin, xelkê bajarê Urmiye yê ne û bi tometa 'Tevilbûn û hevkarîkirina sîxûrtiya ji bo Îsraîlê' hatine cezakirin.

Li gor agahiyê ku Tora Mafê Mirov a Kurdistanê ji çavkaniyek ku nexwestiye navê wî were eşkerekirin wergirtiye, wan girtiyan dibin gef û êşkenceyê de neçar hatine hiştin ku wan tometan li ser xwe qebûl bikin, lê piştî hatine dadgehkirin, wan tometan red kirine û gotine wan dibin gef û êşkenceyê de ew tomet qebûl kiribûn. Ji beriya niha jî gelek kes li Îran û Rojhilatê Kurdistanê bi heman tometa 'sîxûrtiya Îsraîlê' cezayê darvekirinê lê hatine birîn û hin ji wan jî hatine darvekirin.

# Êrîşên dewleta Tirk a dagirker dewam dikin

**Navenda Nûçeyan**

**Navenda Ragehandin û Çapemeniya HPG'ê diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker bi balafir, helikopter û çekên giran çeperên berxwedanê yên Gerîlayên Azadiyê bombebaran kirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê derbarê êrişên artêşa Tirk a dagirker yên ser çeperên berxwedanê yên gerîlayên azadiyê daxuyaniyek da.




HPG'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku li herêma Zapê, di 24'ê Adarê saet 19.00 û 20.30'an de dagirkeran 2 caran êriş birin ser çeperên berxwedanê yên Sîda û hêzên gerîla jî ji bo parastina xwe bersiv da êrişan.

HPG'ê da xuyakirin ku di 24'ê Adarê de derdora Golka ya Metîna, Qadên Berxwedanê yên Girê Bahar, Girê Amediyê û Girê Cûdî û gundê Sêgirê yê Amêdiyê 12 caran bi balafirên şer hatin bombekirin. Herwiha di 24'ê Adarê de Qadên Berxwedanê yên Girê Cûdî, Girê FM û Kurojahro û herêma Saca û çeperên gerîla yên berxwedanê yên Çemçoyê 14 caran bi helîkopterên êrişê hatin bombekirin.

HPG'ê ragehand ku di 24 û 25'ê Adarê de çeperên hêzên wan yên berxwedanê yên li Çemço û Sîda 16 caran bi obus, tank û çekên giran hatin bombekirin.

# SOHR: Di êrîşên Amerîkayê de 19 kes hatin kuştin

**Navenda Nûçeyan**

**Navenda Çavdêrîiya Mafê Mirovan a Sûriyê (SOHR) ragehand ku di bombarana artêşa Amerîkayê ya li dijî nuqteyên leşkerî yên li rojhilatê Sûriyeyê 19 kes hatin kuştin.**

Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) da zanîn ku hejmara kuştiyên ji ber êrişên Amerîkayê yên li dijî nuqteyên komên alîgirên Îranê li rojhilatê Sûriyeyê bû 19.



SOHR`ê diyar kir ku roja pêncşemê balafireke bêmirov êrişî baregeha leşkerî ya Amerîkayê ya li Sûriyeyê kir, di encamê de hevkarekî Amerîkayê hate kuştin, hevkarek û 5 leşkerên din jî birîndar bûn. Lê artêşa Amerîkayê bersiva êrişê da û kuştî çêbûn.

SOHR`ê da xuyakirin ku di 2 rojên borî de di navbera hêzên Amerîkayê û komên girêdayî Îranê de nakokî çêbûn. Her wiha SOHR`ê got hêzên Amerîkayê şeva pêncşemê nuqteyên Pasdarên Îranê yên li beyara Bokemalê ya li rojhilatê Dêrazorê û cihekî din ê milîsan li derdora bajarê Meyadîn ji aliyê başûrê ve û depoyeke çekan û navenda geşkirinê ya li Dêrazorê kirin hedef. Li gorî SOHR`ê, di encama êrişa hewayî de kuştî û birîndarên komên alîgirên Îranê çêbûn.

Li aliyekî din jî çavkaniyên li Sûriyeyê ku ji kanala Press TV a Îranê re eşkere kirine, hedefgirtina nuqteyeke leşkerî ya Îranê derewand û got hêzên Amerîkayê navenda komkirina tovan û navenda geşkirinê ya li herêma Herabiş a li nêzî balafirgeha leşkerî ya Dêrazorê bombebaran kirin û di encama êrişan de tu îranî nehatine kuştin.

# Hefteya Qehremantiyê sembol û lûtkeya berxwedanê ye

Pêşengên PKK'ê, ji 21 heta 28'ê Adarê navê xwe dane nivîsandin û dîrok dane guhertin. Ew zarokên gelê Arî bûn, Ji gelê xwe re xizmet kirin û heta roja me ya îro bi rihê wan têkoşîna azadiya Kurdiṡtanê didome.

**Mihemed Xanim**

Çaxên qehremanî yê mirovahiyê hene. Ev çax bi hezaran sal derbas bibe jî, di hişê mirovayiyê de dibe bingehê wêrektî, rûmet û sekna ku berê xwe daye rojê. Qehremanên gelê Kurd jî navê xwe di rûpelên dîrokê de nivîsandin û hefteya qehremantiyê li ser navê wan hat îlankirin.

**'Hefteya Qehremantiyê' bi Newrozê dest pê dike û bi şahadeta Egîd, 28'ê Adarê bi dawî dibe.**

Hefteya qeheremantiyê di dîroka gelê kurd de bûye rojek ku mirov tûcarî jibîrnake. Ev roj bû dîroka azadiyê. Tevî ku derfetên wê demê gelekî kêmbûn jî, wan hevalan bi sekin û helwestê xwe ji bêderfetiyê derfet ji gelê Kurd re avakirin. Ew leheng bi xweşîkbûna biharê re dibişkivîn û vedibûn. Roj bi roj berxwedan û têkoşînê zêde dibû. Ji çar kesan bûn gelek. Ev kûlîlkek bi navê xwe gelek kulîlk zêdekirin û mezin bûn. Ev kulîlk yek ji wan navê xwe Ferhat kurtay, Necmî Oner, Mahmûd Zengîn û Eşref Anyik e. Wan di têkoşîna azadiye de canê xwe bi rêka qehremantiyê re fedakiribûn. Dewleta Tirk ya faşist ku digot 'Me êdî kurd û Kurdistan ji holê rakirin', herwiha ji xwe re digotin 'Me kurd kûştin me kurd kirin tirbê' . Lê dîsa piştî gelek salan ji nûve rengê biharê bi tekoşînek mezin derket holê. Ti zehmetî bê xweşî nabin û ti xweşî jî bê zehmetî nabin, her weha di rastiya kurd û Kurdistanê de, herdem ji zehmetiyan lehengî tê afaraindin.

**Rêwiyên heqîqetê bûn û gihiştin heqîqetê.**



28'ê Adarê û 18 Gulanê bûye pirek ji xelasiya gelan re. Ev pir di pêşengtiya Egîd de, cara yekê di 15 Tebaxa sala 1984an de, gûleya yekem di mejiyê nijadperestiya dewleta Tîrk de teqand. Vê carê piştî demên gelek dirêj dîsa ji nûve ev deng bû dengê cesaret û hêviyê. Heval Egîd hêviya gelê Kurd wekî ronayiya rojê ronî kir. Heval Egîd bi sedan Egîd avakirin. Şeva 18 gûlanê, heval Ferhad, Necmî, Mahmûd û Eşref, seat çarê sibêhê destên xwe dan hev û wekî ku ew ê dîlanê bigrin, dîlana azadiyê. Van hevalan ji bo tariya şevê bi çirînin û bighin berbanga sibehê, di berbanga sibehê de bi Agirê bedena xwe şeva tarî ronahîkirin, di şeva tarî de sitranê Azadiyê gotin. Ji bo rojên zehmet xwestin kêliyên rizgariyê û kêfxweşiyê bidin avakirin. Di Tariya şevê de li ber ronayiya Agirê xwe sitranê cesaretê û qehremaniyê digotin 'Hevalno ger ku hûn ji me hesdikin hûnê agirê bedena me netefînin. Em dixwazin ji agirê bedena xwe sitranê azadiyê û serkeftinê ji werê bibêjin û em roja ronayiyê avabikin. Êdî em kêfxweşin ku em niha nezî rê heval Mazlûm di bin.'


Ji 12 Aadarê heya 18 gûlanê ji, 18 gûlanê dîsa pirên di nav dilê şoreşgeran de derketibûn holê di hefteya qehremantiyê de tevayî van hevalan ji rastiya jiyanê pêlê ji agir bi qasî çiyayên bilind di nav dilê lehengê dilmezin de cesaretekî bilind avakirin. Ev rastî doza şoreşgertî hîn zedertîr bi watetir kiribû û wateya van qehermenan di dîroka PKK de gihşte astekê ku ji dijmin re bûye dersekî gelek mezin, ji tirsa mirinê jiyana azad û bi wate derxist holê.

**Wekî ku heval Mazlûm dibêje; 'Teslîmiyet ber bi îxanetê ve, berxwedanî jî ber bi serfiraziyê ve dibe**

Şehîd Egîd Tebaxa 1984'an de li gel komek hevalên xwe , wekî fermandarê erkê çalikiyê destpê dike û pêşiya şerê çekdarî vedike. Heval Egîd dibe tirsa dilê dewleta tirkî û kezeba leşkerên tirkî diqetîne. Di demek kurt de heviyek mezin di dilê gelê xwe de ava dike û Şehîd Egîd dibe qehremanê gelê xwe. bi lehengî û qehremanî dikeve dîroka Tevgera Azadiyê û dikeve dîlê gelê xwe. De 28'ê Adara sala 1986 an de, di şerekî de li Gabarê bi lehengî cihê xwe di nav kerwanên azadiyê de digre û digihije asta şehadetê.

Rêber APO, dibejê "Rê heval Egîd, mirov vî rê hevalî nasbike ev rê heval hêja bû û rê heval rêber bû , serokê artêşa rizgariya Kurdistanê bû. Em soz û peyman didin ku te çi ji me xwestibe emê di vê rêkê de bin, em jî wek te soz û peyîman didin ku em jî di vê rêkê de bimeşin û doza te bîgîhîîîn lûtkeya azadiyê;"

## HEFTEYA LEHENGIYÊ



**Ahmet AKTAŞ**

Di dîrokê de şervan, qehreman û lehengên pir gernas û navdar hene. Hilbet li goreyî şerd û mercên têde jiyan e, xwedî rûmetin jî.
Lê hinek jî hene, têkoşerî, lehengî û qehremaniya xwe, ji hişmendî û zanistiya xwe diṡtînin. Van kes û kesayetiyan, bi çalakiyên xwe yên qehremane, him neyarên xwe gelek ditirsîne him jî di dil û mejiyê gelê xwe de cihekî watedar digrin û bi tîpên zêrîn dikevin rûpelê dîrokê.
Li Kurdiṡtanê du mînakên herî berbiçav û zindî, Mazlum Dogan û Mahsum Korkmaz e.
Mazlum, di sala 1982an de li zîndana Amedê, bi canê xwe agirê Newrozê pêxiṡt.
Di şert û mercên gelek giran de ev çalakiya lehengî lidar xiṡt. Du sal derbas bûbû ku faşizma leşkeriya Kenan Evren a 12ê Îlonê, li Kurdiṡtanê agir dibarand, mirov û erdnigarî dabû ber lêdanê û wêranê.
Di demek wisa de ku kes nikare ji tirsa serê xwe bilind bike, Mezlûm, di nava wê wahşeta faşîzmê de, ev çalakiya canbexşane ya qehremane pêkanî.
Vê çalakiya Mezlûm, êşkencekarên faşîzma leşkerî tirsand. Ji ber ku ne li bende curet û îradeyek wisa xurt a şoreşgerî bûn.
Her wiha li gel tirsa zaliman, newêrekiya nava zîndanê jî bi giranî hat şikandin û berevajî, pêla wêrekî û cesaretê bilind bû di nava zîndaniyên Kurdiṡtanî de, bi taybetî jî di nava endamên Tevgêra Azadiya Kurdiṡtanê PKKê de.
Ev ruhê berxwedêr ê bi çalakiya Mezlûm ra hat afirandin, li zîndanê, rê li rêze çalakiyên mezin vekir; çalakiya Ferhatan û Xeyriyan û Kemalan û hwd. Bêgûman ev pêl û bayê berxedanê, her gir û gûr û bilind bû, dîwarên zîndanê qelişand derbasî çiyayên Kurdiṡtanê bû. Li vira jî gihişt xwediyên xwe; hevalbend û pêşeng û fermandarê xwe.
Di çarçova feraset û felsefeya Rêber Apo de li derve, fermandarê HRK(Hêzên Rizgariya Kurdiṡtan) Egît(Mahsum Korkmaz) peyama/fermana Hevrêyê xwe Mazlum hilgirt ser milê xwe û pengava 15ê Tebaxê da despêkirin(15 Tebax 1984). (Di 28ê Adara 1986an de li Gebarê şehîd ket)
Bi vê pengavê re, pira navbêna berxwedana Zîndanan û Gerila hat ava kirin. Her wiha rê li pêşiya şoreşê hat rohnîkirin û vekirin, zemînê têkoşînê hat xweşkirin.
Li ser van pêşketinan PKKê, di kongereya sisiyan de biryara, hefteya navbêna çalakî û şehadetên van pêşengan 21-28 Adarê weke Hefteya Qerhremantiya Netewî ṡtand û ragihandin.
Di encamê de, ew gava despêkê ku Rêber Apo di Newroza sala 1973'an da li qiraxa bendava Çubuka Enqereyê avêt, bi berxwedana Mazlum Dogan a li zîndanê bû ruhê serîhildanê, li ser vê şopê bi fermandariya Mahsum Korkmaz bû cesareta Pêngava 15ê Tebaxê, bi çalakiyên Zekiyan, Rahşanan, Berîvanan, Ronahiyan û Semayan, bû îrade û çanda têkoşîna azadiya gelê Kurdiṡtanê.
Bi vî awayê giyan û cewherê berxwedana dîrokî ya Kawayê Hesinkar û viyana Kawayê Hemdemî Mazlum Dogan gihiştin hev, deng û reng û nasnameya netewî û mirovperwerî, bi raya giştiya navneteweyî hat nasandin, çcspandin û pesendin.
Di heman demê de, ew pêvajoya qirkirina çandî û nijadî ya bi sedsalane li ser gelê Kurdiṡtanê bû hat raweṡtandin, berevajî, pêvajoya xwebûn û azadbûnê hat despêkirin.
Ev pêvajo, nuha di aṡta şoreşê de dimeşe.

## 'PDK bê dagirkeran nikare dewam bike, lewma piştgiriya Erdogan dike'

**Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî ji bo piştgiriya AKP-MHP'ê ya di hilbijartinên Tirkiyeyê de, hîn ji niha de ketiye nava tevgerê. Çalakvanên siyasî û civaka sivîl vê pêngava Barzanî weke xiyanetê binav dikin û dibêjin; "PDK bê piştgiriya dagirkeran nikare temenê xwe dirêj bike."**



Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî ji bo piştgiriya AKP-MHP'ê ya di hilbijartinên Tirkiyeyê de, hîn ji niha de ketiye nava tevgerê. Tê gotin di çend rojên borî de Barzanî li gel hin serokeşîr û kesên dijberê gelê Kurd hin hevdîtin pêkaniye. Derbarê vê pêngava serokê PDK'ê de, çalakvanên civaka sivîl û siyasî axivîn.
Çalakvana civaka sivîl Haje Salar ragihand ku peymanên bi dagirkeran re wisan kirine ku partiyek Kurd ji bo dagirkeran bikeve nava propagandayê û got; "Ev jî encama lewazîbûn û dawîbûna wê partiyê ye. Ev dide nîşandan dan ku PDK bê dagirkeran nikare dewam bike, eger nekaribe piştgiriya partiyên Kurd ên li Tirkiyeyê bike, bila piştgiriya dagirkeran jî neke. Ev pêngav



wê ti bandora xwe nebe, ji ber ku me di hilbijartinên borî de dît, Kurdan serkeftinek çawa bidestxistin. Niha pêwîste partiyên Kurd hîn zêdetir piştgiriya hev bikin, lê alîkaridayîn û piştgiriya aliyek Kurd ya ji bo dewleta dagirker, wisan dike ku parçebûn çêbibe."
Çalakvanê siyasî Piştîwan Mehmud jî derbarê heman mijarê de axivî. Mehmud vê pêngava Barzanî ya ji bo Erdogan şermezar kir û got; "Mixabin li Kurdistanê hertim hêzên xiyanetkar piştgirî dane dagirkerên Kurdan. Li Tirkiyeyê hilbijartinek çarenûsî pêkê, hemû rapor û anket jî dibêjin, Kurd li Tirkiyeyê hêza sereke û diyarkerin. Mixabin tevî vê xebat û têkoşîna mezin ya Kurdan a li Tirkiyeyê, aliyek Kurd li Başûrê Kurdistanê 32 salin piştgirî dide Tirka faşîst. Piştgirî dide wê Tirkiyeyê ku dijî



Kurdan komkujî pêktîne, ev cihê xemginiyê ye. Pêwîste Gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê ji bo rawestandina vê xiyanetê kar bikin." **ROJ NEWS**



# 2 sal agahî ji Rêber Apo nayê girtin


Ji bo hevîdîtina bi Rêber Apo re, di 2 salan de malbatê 131 carî û parêzeran jî 314 carî serlêdan kirin. Lê hemû selêdan bê bersiv man û tu agahî ji Rêber Apo nehatiye girtin.

**Navenda nûçeyan**

Ji bo girtina agahiyan li Ser Rêber Apo ku ev 2 sal agahî jê nehatiye girtin, li Kurdistanê û derveyî wê jî gelek hewldan çêbûn. Nêzî 2 hezar parêzerî daxwaza hevdîtinê kirine û geleka ji wan jî serdana Wezareta Dadê ya Tirkiyê kirin. Lê hemû serlêdanên wan bê bersiv hatin hiştin. Îro dibe 2 sal ku agahî ji Rêber Apo nayê girtin.

**Bi hinceta 'Cezayê Displînê' hevdîtin hatin qedexekirin**

Cara dawî 25'ê Adara 2021'an bû



ku Mihemed Ocalan bi Rêber Apo re axivî. Ew jî bi rêya telefonê 3-4 deqeyan hevdîtinek kir û di nêvî re hat qutkirin. Ji wê rojê ve tu agahî ji Îmraliyê nayên wergirtin. 565 Serlêdan hatin kirin, hemû hatin redkirin. Di nava van 2 salan de Parêzerên Rêber Apo 314 carî serlêdan kirine. Malbata wî jî 131 carî û Wasî jî 120 carî serlêdan kirine. Rojên cejnê yên fermî jî serlêdan hatin kirin, lê yek ji wan jî nehate bersivandin. Hemû hevdîtin jî bi hinceta 'Cezayê Displînê' hatin qedexekirin.
Desteya Dîsîplînê ya Îmraliyê 18'ê Tebaxa 2021'an cezayê 3 mehan ê serdana malbatê da. Û 12'ê Cotmeha 2021'an jî biryara qedexekirina hevdîtina bi parêzeran re ya 6 mehan da. Sala 2022'yan jî Serokatiya Desteya Disîplînê ya Girtîgeha Îmraliyê her 3 mehan carekê 'cezayê disîplînê' da. Ev biryar jî 3'yê Sibatê, 31'ê Gulanê, 9'ê Îlona 2022'yan hatin dayîn. 13'ê Nîsanê û 21'ê Cotmeha heman salê 2 biryarên qedexeya 6 mehan hatine dayîn. Îtirazên li dijî van biryaran jî hatin redkirin. Tirkiyê ji bo mafê hêviyê ti gav navêt. Têkildarî "mafê hêviyê" jî dewleta Tirk tu gav neavêtin. DMME'yê biryar dabû ku çi dibe bila bibe divê mafê hêviyê bê bêkanîn. Ji bo pêkanîna biryarê Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê heta Îlona 2022'yan dem dabû Tikiyê. Lê ev biryar jî nehat pêkanîn. CPT jî navbera 20-29'ê Îlona 2022'yan çû Tirkiyê, piştre ragihand ku serdana Îmraliyê kiriye û ti agahî neda. Piştre parêzeran diyar kir ku Rêber Apo derneketiye hevdîtinê û vê rewşê fikarên wan zêdetir kirine.

**Bi hezaran parêzer ketin tevgerê**

Buroya Hiqûqê ya Sedsalê 31'ê Kanûnê 2022'an serî li CPT`yê da.Û daxwaz kir ku demildest rapora têkildarî serdana dawî bi raya giştî re parve bike. Lê encam derneket. Di vê navberê ji Kurdistan û gelek welatên din bi hezaran parêzer û siyasetmedar ketin nava tevgerê. 691 parêzerên ji Sûriyê 19'ê Îlona 2022'an li ber Meclisa Dada Civakî ya Qamişlo daxuyanî dan. Û di daxuyaniya xwe de ragihandin ku ew dixwazin biçin Îmraliyê.
Navbera 10-17'ê Hezîranê heman salê de li Bakur û Tirkiyê 775 parêzerî hewldanên xwe kirin. Van parêzeran serî li Serdozgeriya Bursayê û Gerînendetiya Girtîgeha Îmraliyê da û xwestin hevdîtin pêk bê.
Ji 22 welatên cuda 350 parêzerî 14'ê Îlonê 2022'an bi heman armancê serî li Wezareta Dadê ya Tirkiyeyê da.
Destpêka 2023'yan jî 32 hiqûqnas çûn Tirkiyeyê û xwestin biçin Îmraliyê, lê bê bersiv hatin hiştin. Ev hemû serlêdan jî bê bersiv hatin hiştin û vaya bû 2 sal ti agahî ji rêber Apo nayê girtin.

# 'Komkujiya Cindêrsê bi destê dewleta Tirk pêk hatiye'

**Hemza Sêvo /Qamişlo**

**Koçberên Efrînê yên li bajarê Qamişlo komkujiya Cindêrsê ya 20' Adarê Şermezar kirin û gotin, komkujiya Cindêrisê bi destê dewleta Tirk a dagirker pêk hatiye û divê cîhan bê deng nemîn e.**

Di 18'ê Adara 2018`an de, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê herêma Efrînê dagirkirin. Ji destpêka dagirkirina Efrînê û heya niha, li hemberî gelê Kurd kuştin, talankirin, revandin , destrdirêjî û işkenckirin ji aliyê dewleta Tirk û komên çete ve pêk tên. Tevahiya kiriyarên dijmirovî yên dagirkeriyê û çeteyên wê li hemberî çavê cîhanê pêk tê, lê herdfem cîhan bêdeng û xwe kerr û lal dike.
Careke din wekî her car komên çete yên girêdayî dewleta Tirk a dagirker li dijî gelê Efrînê komkujî pêk anîn. Di 20 Adarê de, dema welatiyên Cindêrsê xwestin agirê Newrozê dadin, komek çete ya bi navê Ehrara Alşerqiyê ya girêdayî dewleta Tirk a dagirker êrîşî welatiyên kurd kir û gule li wan reşandin. Di encama êrîşa hovane de, çar welatiyên Kurd ku ji heman malbatê ne jiyana xwe ji dest dan û du welatî jî birîndara bûn.
Li hemberî komkujiyê welatiyên Kurd yên Cindêrsê daketin kolanan û banga derxistina çeteyan ji bajarokê Cindêrsê kirin. Herwiha di 21'ê Adarê de cenazeyên welatiyên ku li ser destê çeteyan hatibûn qetilkirin spartin axê.
Li aliyekî din Rêveberiya Xweser ya Bkur û Rojhilatê Sûriyê, partiyên siyasî, rêxistinên civakî û mirovî yên herêmê û gelên bakur û Rojhilatê Sûriyê komkujiya Cindêrsê şermezar kirin û banga derxistina dagirkeriyê ji Efrînê Kirin.
Derbarê komkujiya Cindêrsê koçberên Efrînê uyên li bajarê Qamişlo ji me re axivîn û banga derxistina dagiurkeriya Tirk û çeteyên wê ji Efrîn kirin. Herwiha diyar kirin ku kmomkujiya Cindêrsê bi dstê dwleta Tirk a dagieker pêk hatiye.

**'Deweleta Tirk komkujî pêk aniye'**

Endamê Kombenda Efrîn a Civakî û yek ji koçberên Efrînê yên li bajarê Qamişlo Xelîl Mihemed diyar kir kudewletra Tirk a dagirker bi riya çeteyan planên xwe yên qirêj di



Efrînê de pêk tînin û got: "Ev komkujiya ku di derheqê welatiyên me yên Cindêrsê û bi destê çeteyan pêk hat, kirdar û tewanbarê sereke dewleta Tirk ya dagirker e. Dadana agirê Newrozê ku di esas de pîrozkirina cejna Newrozê ye, lê ji dewleteke mîna dewleta Tirk ya nijadperest re karekî xerab e û xeteriyê li ser ewlehiya herêmê çêdike. Em hemû kiryarên ku dewleta Tirkî di derheqê welatiyên Efrînê de dike,şermezar dikin."

**'Heya kurdek hebe em ê li ber xwe bidin'**

Xelîl Mihemed di dawiya axaftina xwe de, diyar kir ku wê berxwedan berdewam be û wiha axivî: "Em kurd gelekî aştîxwaz in, bi xuşk û biratiya gelan bang dikin, lê dewleta Tirk ya dagirker vê yekê naxwaze, ji ber ku ev yek li dijî desthilatdriya wê ye. Em soz ji gelê hemû herêmên ku hatine dagirkirina re didin, emê dairkeriyê têk bibin, heya kurdek di bin zilm û zordestiyê de hebe, em ê ji bo azadkrina wî berxwdanê bikjin."

**'Agirê Newrozê tirsê dixe dilê dagirkeriyê'**

Koçberê Efrînê yê bi navê Omer Şahîn jî komkujiya Cindêrsê şermezar kir û got: " Welatiyên Cindêrsê yên berxwedêr bê tirs xwestin agirê Newrozê dadin, lê dagirkeran êrîşî wan kirin û 4 welatî bi hovîtî kuştin, komên çete û dagirkeriya Tirkiyê dizanin ku dadana agirê Newrozê tê wateya azadî û dawiya têkbirina zordestiyê , ji ber vê yekê agirê Newrozê mîna sawê ye di dilê wan de û dizanin wê rojek were û lehengekî mîna Kawayê Hesinkar, zordestiya li ser Efrînê û hemû bajarên ku di bin dagirkeriyê de ne, hilîne û wê agirê Newrozê yê ku nîşana azadiyê ye, dade."

**'Divê ev dagirkeriya li ser Efrînê têk biçe'**

Omer Şahîn da zanîn ku gelê Efrînê




pir zor û zilmê ji dagirkeriya Tirkiyê û komên çete dibîn, herwiha diyar kir ku divê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ji nefrîn bên derxistin û axaftrina xwe wiha qedand: "Ji destpêka dagirkirina Efrînê, gelê wê rastî kuştin,işkence û talankirinê hatiye. Ev hemû li pêşiya cîhanê û bi erêkirina wê ji vî tiştî re tê kirin, bêdengiya wê vê yekê piştrast dike û heya niha jî ev tişt berdewam e. Bûyera ku di derheqê welatiyên Cindêrsê de ya di 20'ê Adarê de çêbû dûrî nirxê mirovahiyê bû. Em tev bi vê komkjiyê êşiyan. Herwiha em weke gelê kurd yên Efrîna berxwedêr, vê bûyerê şermezar dikin û banga hêzên navdewletî dikin ku xwe bêdeng nekin û helwstekê nîşand bidin. Herwiha em bang gelê Kurd û hêzên Kurd yên xwedî nirx dikin ku Efrînê ji zilm, kuştin û zordestiya dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê rizgar bikin û welatiyên wê yên resen vegerînin cih û warên wan."

## Ji Mezlûm heya Egîd dîroka lehengiyê



**Farûk SAKIK**

Mahsûm Korkmaz-Egîd, pêşengê pengava 15'ê Tebaxê bû. Bi wê çalakiya xwe bêdengiya 100 salî bi dawî kir. Piştî vê çalakiyê herkesî nav û dengê Egît bihîṡt. Li Kurdiṡtan ev nav belav bû.
Egîd piştî çalakiya 15'ê Tebaxê, bi giranî li herêma Botan şer dikir. Di sala 1986an de piştî newrozê li herêma çiyayê Gabbar bû. Amedekariya hemleya biharê dikir.
Di 28'ê Adarê de li çiyayê Gabbarê şer derket û di vî şerî de şehîd bû. Ev roja şehîd bûna wî ji bo kurdan roja herî bi êşbû. Kurdan çawa lehengiya 15'ê Tebaxê jibîr nekirin, dixweṡtin vê roja reş veguhêrînin vateyek cûda. Di demek waha de li ser peyva 'qehremaniyê' biryar dan.
Ji çalakiya Mazlûm Dogan ya 21'ê Adarê û hetanê şahadeta Egîd ya 28'ê Adarê wek hefteya qehremnaiyê hat îlankirin.
Piştî Mazlûm Daqan, li zîndana Amedê gelek lehengên wek Kemal Pîr, Hayrî Dûrmuş, Alî Çîçek, Akîf Yimaz, Ferhat Kurtay, Mahmûd Zengîn, Eşref Anyik, Necmî Oner mora xwe li dîrokê dan. Nobeda qehremaniyê ji Mazlûm dewr girtibûn.
Û piştî şahadeta Egîd jî têkoşîna ji bo azadiya Kurdiṡtan bê navber domkir. Cîwanên kurd ji bo li mîrasa Egid xwedî derkebin berê xwe dan çiyayên azad, bûn gerîlla, şervan û bûn Egîd.
Bi sal û demê re dijmin teknîka nû û teknolijiya xwe li hember gerîllayên Kurdiṡtan bikaranî. Li her deverî ev teknika wan vala dihat derxistin. Dema ku bi vê teknîkê encam nedigirtin, serî li her cûre çekên qedexekirî kir. Lê dîsa jî encam nedigirt. Bi taybet di van salên dawîde êdî van çekên qedexekirî li berçavên mirovahiyê bêtirs bikardanî.
Gerîlla jî xwe li gor demê û teknîka dijmin birêxiṡtin dikir. Gerîllayên serdemê, gerîllayên nûjen, bi cil û bergên xwe, bi çek û tenîka xwe û bi taktîkên xwe, şer derbasî merhaleyek nû dikirin.
Dema ku di sibata sala 2021'an de li Garê êrişên dijmin deṡtpêkirin me ji têkçûna artêşa dagirker re şahidî kir. Erdoganê behsa mizginiyek kiribû lê bi cenazê çend dîlên şer yên di deṡt PKKê de bûn vegeriyan Enqerê.
Îro jî gerîllayên artêşa Egîd, li heremên paraṡtinê yê Medya li dijî êrişên dijmin bi taktîkên Egîd bersiv didin û Kurdiṡtanê diparêzin. Ne tenê li vê heremê li gelek deverên deskeftiyên kurdan bi taktîkên Egîd di parêzin.
Bi taktîkên şer yên Egîd heremên azad bideṡt dixin.
Di van 2 salên dawî de me şahidiya tiştek dinan kir. Di şerê tunêlan de şahidiya lehengiya gerîlla kir.
Di şerê Tunêlan de dema dijmin bisernediket, serî li çekên kîmyewî dida. Dîsa herkesî şahidî kir ku gerîlla bi çi awayî li dijî çekên kîmyevî şer dike.
Û Rojava…
Berxwedana Kobanê…
Li berxwedana li dijî DAÎŞê. Hemû cîhan şahidî kir ku şervan û gerîlayên artêşa fermandar Egîd çawa dawî li vê dijminê mirovahiyê anîn. Dewletan nikaribû pêşî li vê kareseta mezin bigirin, lê şervanên YPG û YPJ li dawî li wan anîn.
Û dîsa şervanên Enternasyonal. Gelek cîwan ku lehengiya Egîd bihîṡtin, êdî wek berê ji bo Che Guevera derbasî Kuba nebûn, hatin li Kobanê tevlî şervanên parazvanê yên mirovahiyê bûn. Li kileka şervanan cîh girtin, şer kirin û hin ji wan şehîd bûn.